Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1265 16-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 10’emîn Festîvala Wêje û Hunera Jinê

Navenda Nûçeyan

**Hevseroka Desteya Çandê ya herêma Cizîrê û endama komîteya amadekar Firyal Çolê tekez kir ku Festîvala Wêje û Hunera Jinê pireke ji bo kombûna jinên herêmê bi tevahî jinên cîhanê re.**



Bi sponseriya Desteya Çandê ya herêma Cizîrê Festîvala Wêje û Hunera Jinê ya 10’emîn di dîrokê 17’ê Nîsanê li Parka Azadî ya bajarê Qamişlo, bi drûşmeya “Hunera Azad Bi Deng û Rengê Jinê” wê bê li dar xistinê. Festîvala Wêje û Hunerê ya Jinê berhem û jêhatiyên jinan derdixe holê û dibe destekek ji bo tevlîbûna hemû jinên dîtir ku karibin di riya berhemên xwe cihê xwe têde bigrin.

Festîvala Wêje û Hunera Jinê her sal di meha Adarê de dihat li dar xistin, lê bi sedema rewşa awaret û ewlehî îsal hate talaq kirin. Festîval wê sê rojan 17, 18, 19’ê Nîsanê berdewam bike.

Derbarê amadekariyên festîvalê de Hevseroka Desteya Çandê ya herêma Cizîrê û endama komîteya amadekar Firyal Çolê ji rojnameya me re axivî û wiha anî ziman: “Ji destpêka sala 2025’an amadekariya festîvalê tê kirin, îsal me nameya Rêber Apo kir bingeh ji bo li dar xistina festîvalê.” Firyal Çolê diyar kir ku xebatên ku di festîvalê de bên pêşkêşkirin, xebatên wêjeyî, hunerî û karê destan e. Karê destan pîvan jê re hatibûn dayîn da ku tevlîbûn bê kirin, di beşa hunerî de wê Gotar, Çîrok û Helbest bi sê zimanan be.

Li gorî Firyal Çolê komîte ji bo nirxandina berheman hatine avakirin û xebatên xwe dane destpêkirin ji bo hilbijartina berhemên herî baş li ser sê pêvajoyan.

Firyal Çolê wiha pê de çû: “Festîval li ser asta cîhanê bi taybet Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê bê li dar xistin. Derbarê wênexêzên ku bi destê jinan tablo hatine saz kirin, vê sale gelek astengî derketin di milê radestkirina tabloyan bi sedema şert û mercên heyî, li ser asta kantona Cizîrê 40 jin xebatên xwe yên hunerî pêşkêş kirin, komîteya nirxandinê ji bo nirxandina tabloyan jî hate avakirin li ser sê pêvajoyan.”

Firyal Çolê wiha lê zêde kir: “Di beşa Karê Destan de zêdetirî 50 jinan karên xwe pêşkêşkirin e, cihên taybet ji wan re hatiye diyar kirin bi kordînasyona komîteya amadekar re, ji bo berhemên xwe di seranserî sê rojên festîvalê pêşkêş bikin.”

Firyal Çolê tekez kir ku armanca li dar xistina Festîvala Wêje û Hunera Jin ku piştgiriyê bidin jêhatiyên jinê, bi taybet di warê karê destan de, ji bo bibe bingeh û kaniyek ji tevahî jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re.

**Bernameya festîvalê**

Firyal Çolê wiha axaftinên xwe berdewam kir: “Festîval êdî wê 2 seatan ji bo beşa huner û wêjeyî bê pêşkêş kirin, wekî din wê serdan ji bo beşa karê destan bê kirin. Me têkilî bi koman re kiriye ji bo dîlanên jinan, komek ji bajarê Reqa, komek şano ya jin û helbestvanên jin bi zimanê erebî û kurdî tevlî bibin. Di festîvalê de wê senevîzyoneke bê pêşandan tê de wê peyamên pîrozbahiyê ji tevahî jinên cîhanê ku komîteya amadekar karîbû bighêjin wan bê pêşkêş kirin, peyam ji jinên Başûrê Kurdistanê, Rûsiya, Siwêda û ji hundirê Sûriyê û tevahî cîhanê hene. Tevlîbûneke taybet ji saziya “Kezî” ya jinan heye, belgeke fîlmeke li ser jinan hazirkirine wê di roja 2‘an de bê pêşandan.”

Herwiha wê “Di roja Sêyem de senevîzyonkek berfireh li ser tevahî berhemên hatine pêşkêş kirin, wekî din nirxandina komîteya tehkîmê bê pêşandan. Di roja dawî de wê navên jinên serkeftî di beşa wêje û hunerî de bên ragihandin bi zimanê kurdî û erebî.” Li gorî Firyak Çolê di dawiya festîvalê de wê xelat bên dayîn rêza yekem, duyem û sêyem. Dayîna xelatê nayê wateya ku hemû jinên din binketî ne, lê weke taşwîqekê ji bo tevlîbûna hemû jinan bi taybet di beşên hunerî û wêjeyî de. Navên jinên ku bi serkketine veşartî bimîne heta kêliya dawî di festîvalê de.

Hevseroka Desteya Çandê ya herêma Cizîrê û endama komîteya amadekar Firyal Çolê wiha got: “Ev festîval weke riyeke ji bo temsîlkirina dengê jinê yê rastî ye û pireke ji bo kombûna jinên herêmê bi tevahî jinên cîhanê re.”

# Ezmûneke dirêj di warê fotografê de

Navenda Nûçeyan



Feysel Hesen Qadir ku yek ji wênegirên herî navdar yên bajarê Hewlêrê ye, zêdetir ji çarîkê sedsal ezmûn di warê fotografê de heye û di sala 1970’yî de li bajarê Hewlêrê ji dayik bûye. Wî di destpêka salên 1980’î de dest bi karê kirîn û firotina kamerayan kiriye û ji salên 1990’î ve, bi tamîrkirina kameran û fotografê re mijûle û heta niha jî berdewame.

Feysel Hesen Qadir, piştî ku kurseke perwerdeyî li ser kameraya Reflex werdigire, heskirina wî zêdetir ji bo pîşeya wî peyda dibe û şarezayiyeke temam li ser kamerayan peyda dike û piştî demekê jî fêrî şûştina wêneyan dibe.

Feysel Hesen Qadir ku demekê Serokê Komeleya Wênegiran ê Hewlêrê bûye, kariye şiyana xwe di piraniya şêwazên cûr bi cûr yên wênegiriyê de pêşbixe û belgeyên şarezayiyê di fotorafên rojnamevanî, klasîk, makro, felekî û portret de bi dest xistine. Her wiha pêşangeha kamerayan û fotografên kevin jî vekiriye ku beşeke girîng ya dîroka vê hunerê li Kurdistanê nîşan dide.

**‘Berê ev kar şarezabûn dixwest’**

Derbarê cudahiya navbera fotorafên kevn û nû de, Feysel ronahiyê dixe ser wan guherînên mezin yên di warê teknolojiya fotografê de pêk hatine û dibêje: “Kamerayên kevn karkirina wan zehmetir bû li gor kamerayên dîjîtal yên niha, diviya hemû amûrên kamerayê te bi xwe saz bikira, wek kamerayên niha nîne ku hemû tişt li ser ekrana wê be, ji ber vê wênegir diviya gelek şareza bûya.”

Feysel Hesen li ser kamerayên cûrbicûr xebitiye. Navê kamereyên ku xwe bi wan re mijûl kiriye ev in; Zenit, Nikon, Yashica, Praktica, Villa’ û paşê jî kamerayên ‘Kodak, Polaroid’ ku taybetmendiyeke wan a taybet hebûye ji bo derxistina rasterast a wêneyane. Bi pêşveçûna berdewam a kamera û teknolojiya fotografê, Feysel Hesen xwe weke şahidekî zindî yê guherînên hunera wênegiriya Kurdî dibîne. Feysel heta niha jî di veguhestina ezmûnên xwe de ji bo nifşên siberojê karê xwe bi eşqeke mezin didomîne.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**Wê roja te jî were:**
- Dema yek tiştekî ji yekî dixwaze û yê din daxwaziya wî pêk nayne hingê dibêje.

**Wê roja wî were:**
- Dema yek xirabiyê dike û behsa xirabiya wî tê kirin hingê derbarê wî de tê gotin.

**Wisa neke ku pîvazan tevan spî bikim:**
- Ez naxwazim her tiştî eşkere bikim; gelek tiştên ku ez naxwazim bêjim hene.

**Wisa neke ku em bêjin mast:**
- Wisa neke ku em rast bêjin.

**Wisa neke ku kêliyên kevin bibişkêvim:**
- Wisa neke ku ez sûcên te yên kevin bêjim.

**Wisa neke ku kêlîyên berê verêsim:**
- Bi heman wateyê.

**Wisa neke ku li binê kundir bixim:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER REZÎLBÛN Û ŞERMKIRINÊ**

**Awirên xwe revandin:**
- Şerm kir; li ber xwe ket.

**Berrik di bin me de nehişt:**
- Em rezîl kirin; ji ber kiryarên wî em şermezar bûn; kumê me li erdê xist; em hetikandin.

**Çavên wî şor bûn:**
- Şerm kir; li ber xwe ket.

**Çavên xwe nizim kirin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe şkandin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe revandin:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Rêber Apo ji bo pirsgirêka kurd herdem di nava têkoşînê de ye’



Parlementera berê ya HDP’ê Ayşe Acar Başaran diyar kir ku zêdetirî 30 salî ye Rêber Apo ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rê û rêbazên demokratîk ku di qada siyasî de bê çareserkirin lêhûrbûnê dike û xwedî fikir e.**R-4**

## Piştî rêkeftinan...Kiryarên komên çeteyan di Efrînê de

Tevî geşedanên siyasî li Sûriyê û rêkeftinên ku hatine îmzekirin, binpêkirinên komên çete ku Tirkiye piştgiriya wan dike li dijî gelê kurd ên resen yên Efrîna dagirkirî didomin.**R-6**




## Aboriya jin sîstemeke xwetêrkirinê ya jinê ye



Endama Komîteya Aborî ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emel Ibrahîm diyar kir ku 50 koperatîfên bi rengê jinê hatine avakirin û got, “Armanca me ya sereke sîstemeke aborî ku jin karibe xwe bispêre wê; ava bikin.”**R-2**

## ‘Şanogerî bingeha civakê ye’



Yek ji endamên komîteya amadekar ya Mihrîcana Şano ya Şehîd Yekta Herekol û endamê Koma Şano ya Çiya Harûn Hêvî bilêv kir ku Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol di asta pêşxistina şanoya kurdî de gaveke girîng e û wiha got: “Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol bingeha hûnerî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Vê mihrîcanê moraleke mezin di nav civakê de ava kir.”**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1265 16-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# DIVÊ MAFÊ HÊVIYÊ DEMILDEST BÊ DAYÎN

Rêberê Gelan Abdullah Ocalan ji bo aştiyeke mayinde, demokrasî û azadiya gelên herêmê têkoşîneke bêhempa daye û dide meşandin. Di 27’ê Sibatê de Rêber Apo banga dîrokî ya bi serenavê ‘Aşitî û Civaka Demokratîk’ kir. Banga wî li tevahiya cîhanê bû rojev. Gelek dewlet, partî û hêzan piştgiriya xwe ji bangê re nîşan dan. Lê dewleta Tirk heta niha yek gav jî neavêtiye. Ji bo serxistina banga aştiyê divê dewleta Tirk di zûtirîn dem de gavan biavêje û mafê heviyê ji bo Rêber Apo bide.**R-3**




## Ber bi Yekîtiya Kurdan ve



Dîrok şahidiya kêm kêliyan dike ku çarenûsa gelan diguherîne. Gelê Kurd bi sedsalan e ji mafê çarenûsî bêpar maye. Ji bo bidestxistina çarenûsa xwe Kurd gelek têkoşîyan, serî hildan, li ber xwe dan û ji bo pêşvebirina nasnameya xwe bedel dan.**R-5**

Xwe ji mêr rizgar kirin — Nehîr pale R-2

Divê têkoşîna demokrasiya rast bê meşandin — Zekî Bedran R-5


Têkoşîna ‘Mafê Hêviyê’ — Farûk Sakik R-5


Pêdivî bi çalakiyên çandî yên xwerû bi Kurdî heye — Kemal Necim R-7

# Aboriya jin sîstemeke xwetêrkirinê ya jinê ye

Endama Komîteya Aborî ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emel Ibrahîm diyar kir ku 50 koperatîfên bi rengê jinê hatine avakirin û got, “Armanca me ya sereke sîstemeke aborî ku jin karibe xwe bispêre wê; ava bikin.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di seranserî salên dirêj jin ji tevahî qadên jiyanê hatibûn dûrxistin, nemaze jina kurd ku rola wê tenê di hundirê malê de bû, lê piştî şoreşê û damezirandina Rêverberiya Xweser, êdî jin tevlî qadên siyasî, leşkerî û aborî bû, di warê aborî de jî hewildaneke mezin hate kirin da ku sîstemeke aborî taybet girêdayî jinê bê avakirin, êdî xwe bi xwe bibe sermiyanê mal û jiyana xwe, Kongra Star xebat da meşandin da ku aboriya jinê ava bike ku di encamê de gelek proje û hejmareke mezin ji jinan tevlî projeyan bûn.

Di derbarê vê mijarê de Endama Komîteya Aborî ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriya Emel Ibrahîm ji rojnameya me re axivî û wiha anî ziman: “Bi kedeke mezin ji sala 2015’an aboriya jin hate avakirin. Cara yekem ku koperatîf bi rengê jinê hatin avakirin, aboriya jin ji çandiniya genim destpê kir û piştre bi berhemên wê projeyên bazirganî, pîşesazî û hwd.. hatin avakirin. 50 koprtîfên jin hene, hejmareke mezin ji jinan tê de kar dikin.”



**Projeyên di nava aboriya jin de**

Emel Ibrahîm bal kişand ser projeyên aboriya jin û wiha pê de çû: “Projeyên demsalî hene tê de xaniyên bilastîk hene di serenaserî salê tên çandin. Erdên çandiniyê hene tê de (Genim, Kemon, Nok, Ceh û Nîsk) têne çandin. Koperatîfên firneyên nan hene weke (Nanê tenûrê, sêlê û yê stûr) 51 firne li seranserî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene nêzî 300 jin tê de kar dikin, di her koperatîfê de 4 an 5 jin cihê xwe tê de digrin. Kargeheke şêraniyê li Amûdê heye bi navê (Lara) nêzî 15 jin tê de kar dikin. Li Reqa cihê karê destan heye weke xwarinên mûnetê bi navê(Zad El-Xêr). Li bajarê Hesekê Kargeha cilan bi navê (Lavîn) heye tê de nêzî 50 jin kar dikin, dikanên ku cil lê tên frotin li Qamişlo, Hesekê, Tirbespiyê û Girkê Legê ne. Projeya Mûbîlya heye du beşên wê hene li Qamişlo û Dêrikê bi navê(mûbîliya Star).”

Emel Ibrahîm destnîşan kir ku di encama êrişên dewleta Tirk li gelek deveran av û elktrîk dihat qutkirin û wiha got: “ Lewma vê yekê bandoreke pir mezin li projeyan dikir û gelek deman dihatin sekinandin, nexasim îsal di encama kêmbarîna baranê jî bandor li projeyan hate kirin.”

**‘Berhem li bazaran tên pêşkêşkirin’**

Emel Ibahîm wiha got: “Berhemên projeyan di bazaran de têne pêşkêşkirin û frotin, diravê ku ji koperatîfan tên bi rêjeya 15% dikeve sendoqa aboriya jin ji ber ku rêjeya aboriyê jî tê de heye, 10% dikeve sendoqa koperatîfan da ku bi xwe hewcdariyên xwe vegerîne. Kedkarên ku di çandinî û malên bilastîkî de kar dikin fonê wan hene, xebatkarên navendî hene û yên projeyan hene.”

**Pilansaziya nû**

Emel Ibrahîm plasaiyên ku li ser xebatan dikin anî ziman: “Li bajarê Amûdê bazareke ji bo jinê wê bê vekirin, pêşengeha karên destan bê çêkirin lê cih nehatiye diyarkirin, herwiha perwerdeyên meslekî û fikrî wê bên li dar xistin, ji ber pisporên bi awayekî baş kar bikin kêm in weke warê çandinî, pîşesazî, bazirganî û dirûtinê, hewcdariyeke mezina ya pisporan heye. Lê di encama êrişên dewleta Tirk ên vê dawiyê ev plansazî hatin sekinadin, lê bi zelalbûna rewşê wê proje bên domandin.Di vê dawiyê de biryara hate derxistin ji aboriya giştî ya jinê ku 6% destek bidin çandina sebzeyan ji bo hevsengî di navbera hemû projeyan û xwetêrkirin çêbibe.”

**Asta guhertina aboriya jin di nava civakê de**

Emel Ibrahîm wiha diyar kir: “Dema ku mirov dibêje aboriya jin tiştek balkêş e, cara yekemîn di asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de projeyek wiha hate pêk anîn, armanc jê asta jinan pêş bixin û jin karibe xwe bispêre xwe, herwiha jina ku tenê malbata xwe îdare dike aboriyeke wê hebe, di riya komînan em xwe dighînin van jinan ji bona ku cihên xwe di van pirojeyan de bigrin, astengî hene lê piraniya jinan xwestekên wan hene ku cihê xwe di nava van koperatîfan de bigrin.”

Emel Ibrahîm wiha dawî li axaftina xwe anî: “Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê derfeteke mezin daye jinê di nava kar de, lê heta vê rojê hîn jî civak jinê diçewisîne, divê jin êdî li berxwe bide. Deriyê me ji hemû jinan re vekirî ye, eger pirojeyên jinan hebin bile berê xwe bidin navenda me, emê ji hêla xwe ve destekê pêşkêşî wan bikin, gelek jin tên lê bi tirsin, eger vê tirsê ji nav xwe derxin, wê gelek gavan pêş bixin.”

## Ji Pênûsa Jin

### Xwe ji mêr rizgar kirin

**Nehîr Pale**

Ji bo jin bighîje asta xwebûnê û ji mêr rizgar bibe hinek pêvajo hene divê têre derbas bibe. Di destpêkê de dibe vê yekê weke dozeke siyasî û bîrdozî binirxîne û têkeve nava lêgerînên çima civak cûdayî dixe navbera jin û mêr? Çima ewqasî tûndî li jinê tê kirin, girîngî didin mêr, jinê lawaz dibînin, hemû pirsgirêkan dixin sukra wê de, têkçuyîna xwe bi jinê rave dikin, berê jinê didin mirinê, îxanetê li jinê dikin, wê cinsê duyemîn dibînin, difroşin û dikrin, lanet lê tînin, wê dikin dostê şeytan û dişewitandin, bidarve dikin, di zîndanan de dirizîn in? Ev rêbaz hemû dibin sedema ku jin di ruh de bi zilam ve were girêdan û nikaribe dûr yan jî bê mêr bijî. Her wiha mirov dikare bêje jina ku nikare ji mêr dûr bikeve ew heyanî hestuyê xwe ketiye nava koletiyê de.

Di ruh û mejî de rizgarbûna jin ji mêr yek ji rêbazên ku jin gelek pirsgirêkên xwe çareser bike. Mêr dibe sedema ku jin her tim xwe lewaz bibîne, teqlîda mêr bike, yan jî hemû enerjiya xwe ji bo bala mêr bikşîne ser xwe, dide bi kar anîn.

Jin lewaz û mêr hêz dîtin pirsgirêkeke zihnî û ruhî ya heyanî hestuyê jinê çuye. Ji zaroktî heyanî çavên xwe li dunyayê digre ev zîhniyet di xwîna wê de dimeşe û qet destûr nadin wê ku li ser tiştekî dîtir bifikire. Tenê ji wê têxwestin ku aliyê bi hêz ku ew jî mêr e, razî bike. Ev zîhniyet bermahiya gemara civaka zayendperest e. Hemû jin li ser vê zîhniyetê têne perwerde kirin û mezin kirin. Di hemû gavan de destûr nadin ku jin nefes bistîne. Ji xwe jina vê yekê qebûlneke, tehemul neke yan li dijî wê derbikeve, dawiya wê kuştin, intîhar û mirin e.

Di vê rewşê de wê jin ji aliyê zîhnî û ruhî de xwe çawa ji mêr rizgar bike. Heyanî rizgar nebe ew ê nikaribe bibe xwedî îrade, sîstema hevserokatî wê neyê rûniştandin, wekhevî di navbera jin û mêr de çênabe, naghîje xwebûna xwe, naguhere û pêşnakeve.

Dema ku jin dev ji hevjînê xwe berdide û dibe miriyê kurên xwe nayê wateya ku ji mêr rizgar buye. Girêdana jin a bi bav, bira û kur ve mîna girêkeke kor e. Ev girêdan dikeve bin xizmeta zayendperestiyê de û firset nade ku jin nêzî hev bibin. Yek ji şertê rizgarbûna jin ji mêr ew e ku nêzî jin bibe û ji dilê xwe wê hîs bike. Di civaka zayendperest de jin ji hevdû heznakin û bi koranî bi mêr ve têne girêdan. Ev girêdan jinê lewaz dike, gelekî zehmet dibe ku têkeve nava lêgerînên cûda û li hebûna xwe bipirse, êdî fêrî koletiyê dibe û teslîm dibe. Rizgarkirina jin ji mêr û zîhniyeta baviksalarî ne hesan e. Têkoşîneke bîrdozî û siyasî ye. Jina ku ew gihandina asta li ser mêr bimre, heyanî ruhê xwe ji vê yekê rizgar bike têkoşîneke xurt dixwaze. Jina ku têkeve nava lêgerîna xwe ji mêr û koletiyê rizgar bike wê di têkoşîna xwe de bighîje çareseriyê.

# Kiryarên dijmirovî zêde dibin û kujer nayên darizandin

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Di dîroka 6’ê Nîsana 2025’an de, du jin ji eşîreya Bûbetûş li kantona Minbicê ku di bin desthilatdaiya çeteyên dagirkeriya Tirk de ne, di bin navê şerfê bi destê bav û bira hatin kuştin. Li gorî agahiyên li ser medyaya civakî ev sûc piştî revandina her du jinan ji hêla bazirganên Tirk û çeteyan pêk hat ku di madeyên hişbirê de kar dikin.**



Sûceke din der heqê jinan de pêk tê, di bin navê şerefê û adetên paşverû ku jin dibe qurbanî û sûcdar nayên ceza kirin. Li kantona Minbicê û gundê Meran bi awayekî hovane du jin hatin kuştin û li ser medyaya civakî dîmenên wan hatin parvekirin. Ev sûc di nava rêzebûyerên kuştinên li herêmên di bin desthilatdariya çeteyên dewleta Tirk de pêk hat. Endama Mala Jinê ya Kombûna Zenobiya Semîra Muhemed Şahidê vî sûcê hovane şermezar kir û wiha got: “Kuştina her du jinên bêguneh bi awayekî hovane li kantona Minbicê nayê qebûl kirin. Piştî şoreşê jinê di her qadan de şer û berxwedan daye meşandin û di asta pêşengiyê de cihê xwe girtiye. Hişmendiya baviksalaraî heya roja îro tûndiya fîzîkî û derûnî li ser jinê pêk tîne bi taybet li herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de, ku her dem ji fikir û azadiya jinê ditirse lewma û bi her awayî jinan dike hedef.”

**‘Piştî têkbirina DAIŞ’ê em binpêkirina nema qebûl dikin’**

Semîra Muhemed Şehada wiha domand: “Piştî berxwedan û têkoşîna bêhempa ku jinan pêk anîn li dijî çeteyên DAIŞ’ê, em êdî careke din mîna ew fikrê reş û zordar vegere ku ji nû ve mafê jinan binpê bike qebûl nakin, piştî hemû qurbaniyên ku jinê pêşkêş kir ji bo xwe ji zilm û koletiyê xelas bike, em ê nehêlin cardin binpêkirinên dijmirovî der heqê jinan de pêk dihat; vegere.”

Semîra Muhemed Şehada wiha anî ziman: “Her roj li herêmên dagirkirî revandin û kuştin derheqê jinan de pêk tê zêde bibe, helbet ev bûyer çavkaniya xwe ji desthilata serdest digre. Ji ber nebûna cezayan rêjeya kuştin û kiryarên dijmirovahî li dijî jinê li bajaran zêde dibe û deriyê tundiyê bêhtir vedike. Banga me ji bo jinan ewe, ku bêdeng nemînin, herwiha li dijî van sûc û binpêkirinan bisekinin.”

Di dawî de Semîra Muhemed Şehada daxwaz ji raya giştî û rêxistinên mafên mirovan kir ku li hember van kiryar û sûcên dijmirovahî der heqê jinan de pêk tê bêdeng nemînin û wiha got: “Em daxwaz dikin ku li gorî qanûnên mirovî cezayên herî giran derheqê sûcdaran pêk bê.”



# ‘Şanogerî bingeha civakê ye’

Yek ji endamên komîteya amadekar ya Mihrîcana Şano ya Şehîd Yekta Herekol û endamê Koma Şano ya Çiya Harûn Hêvî bilêv kir ku Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol di asta pêşxistina şanoya kurdî de gaveke girîng e û wiha got: “Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol bingeha hûnerî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Vê mihrîcanê moraleke mezin di nav civakê de ava kir.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

27’ê Adarê Roja Şanoyê ya Cîhanê ye. Di vê rojê de du şanogerên Kurd tên bibîranîn. Tesaduf jî ev e ku şanogerê Kurd Gafur Dogan (Hêvî) di 27ê Adara sala 1971’an de ji dayik dibe. Şanoger û şoreşger Yekta Herekol jî li bajarê Helebê li hemberî komkûjên rejîmê, di 27’ê Adara 2004’an, Roja Şanoyê ya Cîhanê de, ji bo bêdengiya hunermendan şermezar bike bedana xwe dike agir û nemir dibe. Bi boneya Roja Şanoyê ya Cîhanê her sal 27’ê Adarê li Qamişlo Mihrîcana Şano ya Şehîd Yekta Herekol tê lidarxistin.

Derbarê 7’emîn Mihrîcana şano ya Şehîd Yekta Herekol de, endamê komîteya amadekar ya mihrîcanê Harûn Hêvî ji rojnameya me re axivî.



**‘Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol bingeha hûnerî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye’**

Endamê Koma şano ya Çiya Harûn Hêvî û yek ji endamê komîteya amadekar ya mihrîcana şano ya Şehîd Yekta Herekol, cudahiya mihrîcanên salên borî anî li ser ziman û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Salên destpekê yên mihrîcanê tenê ji ber astengî û kêmahiyan derfetan tenê bi zimanê Kurdî şano dihatin pêşkêşkirin û şanoger tenê Kurd bûn. Lê sala 7’emîn de bi mihrîcanek pir zimanî û pir çandî hat rêvebirin. Gelek zimanên cuda yên biyanî jî hatin werger kirin. Li gor salên berê pir berfireh hatin meşandin û aliyê xwe yê navnetewî derkete pêş. Li ser asta Kurdîstanî û tevahî Sûriyê jî tevlîbûnên şanogeran û komên şanoyan hatin kirin. Herêmên rizgarkirî weke Reqa û herêmên din yên pêkhateyên Ereb û bajarê Siwêda ya Sûriyê jî şanoger tevlî mihrîcana 7’emîn bûn. Di aliyê hûnerî de kêmekê kêmahîyên me hebûn, lê dikarin bên sererastkirin. Şanogerî xizmetgûzarî û bingeha ya civakê ye, ji ber wê jî pêwîste bên xurtkirin. Rûxmî zehmetî û êrîşên li ser herêmê dimeşin yên ji bona astengikirina mihrîcanên hûnerî û ji aliyê welatiyan de bi coş û kelecanekî mezin hatin pêşwazî kirin. Ev jî, ji bona me cihê keyfxweşî û şanazîyekî mezin e. Ev mîhrîcana şanoyê îsal ji bona şanoger û welatparêzê di êrîşa dewleta Tirk ya dagirker de gehiştibû asta şahadetê Cuma Xelîl (Bavê Teyar) diyarî hat kirin. Tevlîbûnekî girseyî di hemû aliyan de hatin kirin û erenî bû. Welatiyên Qamişlo û bajarên Rojavayê Kurdistanê û xwandekarên zanîngeh û peymangehên hûnerî jî tevlî vê mihrîcanê bûn. Hemû komên şanoyê û şanoger û desteya amadekar hatin xelatkirin.”



**‘Piştî şer, pevçûn û êrîşên li ser herêmê ev mihrîcan moralekê mezin di nav civakê de ava kir’**

Harûn bibîrxist ku mihrîcanên wiha asta pêşketina civakan didin xuyakirin û wiha berdewam kir: “Ev mihrîcanê bandorekê pir erenî li ser civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava kir. Ji ber ev demekê dirêje li ser herêma me, gef û êrîşên dewleta Tirk ya dagirker hene. Heya niha jî gel û şervanên azadiyê mil bi mil dane hev berxwedanî dikin. Li Rojhilata Navîn derdorên desthiladar û rêjîmên xînxwar hemû hilweşîyan, lê tenê modela demokrasî û azadiyê ya Rêveberiya Xweser xwe li ser lingan girt. Ji ber ku fikir û felsefeya gerdûnî ya Rêber Apo hatiye avakirin. Ev gel û civaka ku bin modela Rêveberiya Xweser de jiyan dikin û xwe rêve dibin pêwist e di aliyê çandî û hûnerî de jî bên naskirin. Pêwîstiya civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi moral û şahiyên hûnerî jî hene. Qadên Rêveberiya Xweser tenê bi şer û pevçûnan divê neyin naskirin. Ev mihrîcan li ser du xalan pir girîng e; yekemîn: ji bona danasîna çand û hûnera Kurdistanî û heremê, ya duyemîn jî: pêşiya bişaftin û helandina salan bê girtin e. Yek jî girîngiya lidarxistina van mihrîcanên wisa ev e ku civak zêdetir bikare hêz û kevneşopîya xwe nas bike ye.  Piştî bang û peyamên Rêber Apo yên weke 27’ê Sibatê, 8’ê Adarê û 21’ê Adarê çava di nav gel û civakê de bi coş û kelecan dabe avakirin, di heman demê de jî ev coş û kelecan gehişte lûtkeya bilind û ev mihrîcan jî bû sedemekî wan peyam û bangên Rêber Apo. Ji xwe ger ku têkoşîn û berxwedana



Rêber Apo ya salan nebûya û di heman demê de jî, şervan û gelê fedekar yên heya roja îro li berxwe didin, ev mihrîcana bi saya wan tê lidarxistin. Ev mihrîcan mîrateya keda şehîd Hêvî, Yekta û şanoger Bavê Teyarin. Em wê mihrîcanê weke desteya amadekar diyarî Rêber Apo, şervanên QSD’ê, gerîlayên serê çîya û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin. Ev mihrîcan bi keda hemû kedkarên çand û hûnerê hat lidarxistin.”

**‘Weke Komîna Şano ya Çîya plansazîyên me yên hûnerî dê bidomin’**

Hêvî di dawîyê de spasiya saziyên ku tevlî mihrîcanê bibûn kir û axaftina xwe wiha qedand: “Plansaziyên me yên di asta hunerî de dê berdewam bikin. Pîştî betlana dibistana ya salan e em ê dest bi çalakî û mihrîcanên hunerî bikin. Em ê taybet pêşerojên civakê yanî zarokan destpê bikin û komên zarokan û ciwanan ava bikin. TEVÇAND Mezopotamya û Komîna Şano ya Çiya  em ê çalakiyên cûrbecûr li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk bînin. Ji bona ciwan û zarokên kurd û herêmê ev 3 mehên ku betlane ye, tiştên cuda ve mijûl nebin û çand û hunera xwe ji dûrnekevin em ê her qadê jiyanê bikin dibistanên hunerî. Di heman demê de jî em weke desteya amadekar ya mihrîcanê spasiya saziyên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, şanogerên ji derve û tevahî Sûriyê de bi şanoyên xwe tevlî bibûn, welatiyên ku em tene ne hiştin sazî û endamên Ragihandina Azad yên ku roja destpêkê heya roja dawiyê mihrîcan şopand û ked dabûn spasiya xwe ji wan re rêdikin. Herî dawiyê jî bangamin hemu şanoger û hunermendên ji ber sedemên cuda welatin xwe terikandine ye bila vegerin welat û em bi hevre ji bona welat kar bikin.”

## Têbînî



### Pêdivî bi çalakiyên çandî yên xwerû bi Kurdî heye

**Kemal Necim**

Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jiyana civakî, siyasî, aborî û têkiliya di navbera pêkhateyên civakê de li ser rêgezên Peymana Civakî tê birêvebirin. Di peymana civakî de sê zimanên fermî yên sereke li herêmê hene, Kurdî, Erebî û Sûryanî. Hemû saziyên Rêveberiya Xweser hewl didin di têklî û belgeyên fermî de her sê zimanan bikar bînin.

Bikaranîna sê zimanan ne tenê di têkiliyên fermî de tê bikaranîn, her wiha di hin çalakiyên civakî, siyasî û çandî de jî tê bikaranîn. Ev reftar bê guman reftareke şaristane û pêşketî û dadmend e ku rê li ber hemû pêkhateyan vedike bi zimanê xwe yê resen beşdarî kargêrî û çalakiyên civakî bibe.

Di çalakiyên çandî de ku li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûryeyê têne lidarxistin weke festîvalên mezin mîna Helbest, şano, huner û HWD. Dema ku mercên beşdarbûna van çalakiyan têne eşkerekirin rê ji bo beşdarbûna bi her sê zimanan tê vekirin û hemû amadekarî li gorî sê zimanan tê kirin.

Heta vir rewş hemû asayî û şaristanî ye, lê tişta ku hêdî hêdî li ser erdê rûdidin ne wiha ye. Pir caran ji ber ku pêkhateyên din bi Kurdî nizanin, bi awayekî xweber berê têkilî û danûstandina çalakiyê ber bi erebî ve diçe, ji ber ku kurdên beşdarên çalakiyê bi Erebî dizanin, lê Ereb bi kurdî nizanin. Di hin çalakiyên siyasî de, mîna panêl û komxebatên gotûbêjê ev arîşe bi rêya wergerandinê tê çareserkirin. Lê rewş di çalakiyên wêjeyî de ne wiha ye.

Bi salan li ser ziman û wêjeya Kurdî qedexe û çewisandina giran hebû, lewma derfeta civaka kurdan pir çênebû ku wêjeya xwe têr û baş gotûbêj bikin, nas bikin, binirxînin, rexne bikin û pêş bixin. Lewma niha gelek saziyên ku bi kar û barên çandî re mijûl dibin hatine avakirin da ku karibin wan demên dirêj ên windabûyî vegerînin û mijaraên wêjeya kurdî, zimanê kurdî, şanoya kurdî, hunera kurdî bidin ber çavê nirxandinê û hewl bidin ku bighînin asta wêjeya cîhanê. Lewma hewce ye ku der barê van mijaran de çalakiyên berfireh, kûr û demdirêj bêne lidarxistin. Ev çalakî wexta ku bi sê zimanan tên lidarxistin, naverok, ziman, taybetmendî û xweseriya çand û wêjeya kurdî di nav de winda dibe, ji ber ku piraniya gotûbêjan, berheman wê bi zimanên din bin, bi taybet bi zimanê Erebî bin.

Bê guman çalakiyên bi sê zimanan ne tiştekî şaş e. Lê pir hewce û grîng e ku li kêleka wê çalakiyên pir berfireh, demdirêj û kûr lê xwerû bi kurdî bêne lidarxistin. Weke mînak carê salane bi boneya roja zimanê Kurdî pêşangeha pirtûkên kurdî dihate lidarxistin, lê mixabin ew çalakî hate betalkirin.

Her wiha pêwîste salane mihrîcanên wêjeyê, çandî û hunerî û yên ziman li ser asta Rojava lê xwerû bi zimanê kurdî û naveroka kurdî bêne lidarxistin. Ji bo parastina taybetmendî û xweseriya her çandekê pêwîste di hundirê her desteyeke çandê de ofîsên taybet yên her zimanekî hebin ku tenê bi kar û barên çanda wî zimanî ve mijûl bibin.

Ev kiryar û reftar ne reftareke nijadperestî ye yan jî ferzkirina yek zimanî ye, lê belê rêzgirtina taybetmendî û xweseriya ziman û çanda kurdî ye ku bi salan hatiye qedexekirin. Eger bi hênceta rêgezên bîrdozî em guh nedin xweseriya çanda kurdî dê her û her ziman, wêje û hunera kurdî li paş bimîne.

# Çarşema Sor



Cejina Çarşema Sor cejina herî kevnar a civaka Êzidî ye. Ev cejin her sal di çarşema duyem a meha Nîsanê de tê pîrozkirin. Li gor baweriya Êzîdiyan di vê çarşemê de gerdûn hatiye avakirin.

**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

Cejina Çarşema Sor cejina herî mezin a civaka Êzidî ye de. Ev cejin her sal di çarşema beriya meha Nîsanê tê pîroz kirin. Li gorî ola Êzidî di çarşema beriya meha Nîsanê de heyînên zindî û gerdûn hatiye avakirin. Di aliyê zanistî de jî dibêjin ku diniya yan jî gerdûn piştî teqîna mezin ku pêk hat gerdûn hat avakirin. Civaka Êzidî bi hezarên sala vê cejinê pîroz dike. Vê civakê beriya her kesî teşe û çawa avakirina gerdûnê dizanîn. Di cejina Çarşema sor de civaka Êzidî hêkan dikelînin ji ber ku heyanî ku hêk neyên kelandin wek di hundirê hêkê dê teşeyê gerdûnê çênabe. Ji ber vê yekê divê hêk bê kelandin ji bo ku teşeyê gerdûnê bide. Wek tê zanîn di nav hêkê de şeklê rojê jî heye, ew jî zerika hêkê ye. Serê sibeha cejinê her kes zû ji xew radibe û berê xwe dide rojê ji bo hemû diniyayê ibadet dike, piştî wê ji bo mêhvanan lawir tên serjêkirin û şîrnahî tê belavkirin û hêk bi hemû rengan tên rengkitin. ji ber ku dema gerdûn hat avakirin her der bi gulên renge reng hat xemlandin. Serê sibê her kes berê xwe dide çolê kulîlkên sor berhev dike û dibe mal di gel qalikên hêka bi deriyê malê ve dikin, wata vê yekê jî, ji bo ku ji her êrîşê bên parastin. Her wiha di roja cejinê de qalikên hêkê her kes dibe nav dexil û danê xwe ji bo ku Xwedê berket bavêje nav. Serê sibê yên ku miriyê wan yên nû jiyana xwe ji destabin hebin diçin ber mezargehên xwe yên pîroz û serdana miriyên xwe dikin, di heman demê de xwarinê dibin li wir belav dikin.

Gelên Êzîdî li seranserî cîhanê belav bûne. Bi taybet jî li başûrê kurdistanê û Îraqê, paytexta Nînawa ya Îraqî û bajarên ku herî zêde kurd lê jiyan dikin. Herwiha li Tirkiyê, Rûsiya, Ezerbîcan, Ermîniye û herî zêde li Ewropayê jî gelek Êzîdî hene.

Êzdiya navê Çarşema Sor li cejna xwe kirine, ji ber ku di vê rojê de xweda xwîn rijandiye laşê Adem, goşt li ser wî temam bûye, xwîn di laşê wî de herikî û jiyan li ser gerstêrka cîhanê vejiyaye.

**Baweriyên civaka Êzîdî ji Çarşema Sor re**

Di baweriya Êzîdiyan de, di vê mehê de xweza xwe nû dike û hêk çêdibe. Ji ber vê jî hêk di baweriya wan de girîng e. Di vê rojê de êzîdî 12 hêkan dikelînin û her 3 hêkan bi rengê demsalekê dixemilînin. Hêk di baweriya êzîdiyan de sembola erdê, avabûn û vejîna jiyanê ye. Ango tiştê di hundirê hêkan de, di erdê de jî heye. Kelandina wê nîşaneya çêbûna erdê û qalika hêkan jî helandina qeşayê ye, her wiha rengê ku li hêkan dikin jî nîşaneya hatina Melekê Tawis, gul û jiyan dest pê kiriye.

**Çar cejin di Rojekê de tên pîroz kirin**

Di baweriya êzîdiyan de Çarşema Sor çar cejinan bi hev re dike yek. Yekemîn cejin dema gerdûn çêbûye û teqiyayî. Ji çar hêmanan pêk hatiye av, ax, ba û agir. Ango hêmanê hişk, rûn, gaz bilezme bi hev re bûne yek stêrk û gerestêrk çêbûne.

Cejina duyemîn bîranîna kelandin, cemidandin û keskaniya erdê radigihîne. Ev jî bi kelandin, cemidandin û rengkirina hêkan didin diyar kirin.

Cejina sêyemîn jî dema xweda yekem zindî afirandiye û xwîn berdayê bedena wî. Ji ber vê jî dibêjin çarşema sor di Nîsana ku gulên sor û rengîn.

Cejina çaramîn ya berketê ye ango hêka yekem hatiye afirandin û zindiyê yekemîn hatiye xuliqandin. Ev jî çêbûna gerdûnê dide nîşan kirin.

**Peresgeha Laleşê**

Li perasgeha Laleşê di danên êvarê de agir pêdixin, li kolanan mûmên ji zeyta zeytûna pêdixin. Ciwan jî li qadê agir gur dikin û xwe ser re davêjin. Bi avêtina li ser agir ciwan dibêjin:"Ey agir, rengê zer bibe û rengê xwe yê sor bide min."ango rengê zer nexweşiye û ya sor jî tenduristî û saxî ye. Her wekî tê zanîn agir di ola Êzîdiyan de pîroz e. Nîşaneya ronahiyê û xelasiya ji reşiyê ye.

Peresgeha Laleşê, di baweriya Êzîdiyan de Laleş cihê herî pîroz e, li geliyê Şêxan dikeve, ji hêla Sumeran û hin şaristaneyên din ve hatiye avakirin. Êzîdî carekê di jiyana xwe de diçin ber lalişê û şeş rojan dimînin.

Her wiha kesên li wê herêmê dimînin di payîzê de serlêdana lalişê dikin, ji 23'ê Eylûlê heya bi 1'ê cotmehê dimînin.

**Mîtolojiya baweriya êzidiyan**

Çarşema Sor di mîtolojiya baweriya Êzidiyan de, teqabulî roja afirandina alemê dike. Dinya di wê rojê de hatiye avakirin û Melekê Tawis hatiye ser rûyê zemînê. Ev roja pîroz, roja efûkirina gunehan, pak û paqijbûna ji gemariyên dinyayê ye. Ev roj, roja afirandina silhê, qayîmkirina biratiyê ye. Çarşema Sor an ku Çarşema Serê Nîsanê, di mîtolojiya Êzidiyan de destpêka biharê, an ku roja nû ye. Di baweriya Êzidiyan de ev roj, Melekê Tawis xirabiya li ser dinyayê xelas dike û qenciyê li hemû mirovan pêk tîne. Meha Nîsanê ji ber van sedeman ji aliyê Êzidiyan ve wek meheke pîroz û bûka 11 mehan tê qebûlkirin.

# Piştî rêkeftinan...Kiryarên komên çeteyan di Efrînê de

**Esma Mistefa/Qamişlo**

**Tevî geşedanên siyasî li Sûriyê û rêkeftinên ku hatine îmzekirin, binpêkirinên komên çete ku Tirkiye piştgiriya wan dike li dijî gelê kurd ên resen yên Efrîna dagirkirî didomin.**




Tevî ketina hêza asayîşa giştî yên girêdayî hikûmeta demkî bo nav bajarokên herêma Efrînê û nav bajêr, lê belê komên çeteyan û niştecihên ku hatine li herêmê bicih bûne, bi awayekî dubare û bê tirs kiryar û binpêkirinan pêk tînin. Ev yek di bin çavdêrî û dîktatoriya dewleta Tirk a dagirker de, li dijî gelê Kurd ê xwecihî tê domandin.

Piştî ku zêdetirî heft salan li bendê bûn, hin malbatên kurd ên ku vegeriyan gundên xwe yên herêma Efrînê ya "Çiyayê Kurmênç - Kurdax" nekarîn di malên xwe de rûnin û dukan û milkên xwe bi dest bixin. Di encamê de komên çekdar berdewam in li ser berfirehkirina bandora xwe, ku ji serkirde û endamên komên girêdayî Îtîlafa Sûriyê û hikûmeta wê ya berê hatiye hilweşandin pêk tê, ji diz û kesên bênas yên ku riyan digirin ku ji aliyê istixbarata Tirkiyê ve têne bikaranîn.

**Piştî lihevkirinan kiryarên dagirkeriyê**

Kiryarên dagirkeriya Trikiyê û komên çeteyan li Efrînê di bin bêdengiyeke navnetewî û herêmî de têne domandin. bi taybet piştî geşedanên dawiyê yên ku di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê a nû de hatine pêşketin ku divê desrwerdan li gelê kurd di Efrîn û her du taxên Şêxmeqsûd û Eşrfiyê neyên kirin. lê belê çiqas ev yek hate parastin girîng e. her şiqasî ev lihevkirin û rêkeftin bi awayekî temamî nehatibe bicih kirin jî, lê divê dawî li rewşa tirs, dizî, binpêkirin, kiryar, girtin û desteserkirina mal û milkên gelê resen yên di Efrînê de bê kirin.

**Girtina welatiyên ku ji Helebê derbasî Efrînê dibe**

Di nava kaosa ewlehiyê, nebûna edalet û hesabpirsînê, belavbûna çekan di destê çekdar û niştecihan de, û nekarîna Dezgeha Ewlekariya Giştî ya pêkanîna erkên xwe de, binpêkirin û tawanên li dijî nifûsa xwecihî ya Kurd ji aliyê komên çete û niştecihan ve li herêma Efrîn zêde dibin. Di çarçoveya desteserkirin û binçavkirina gel de, endamên nuqteya kontrolê ya ewlehiyê ya li ber deriyê bajarokê Racoyê li gundewarê Efrînê, bi serokatiya kesê bi navê "Salih" ji bajarê Derayê û "Mihemed Hec Elî" ji bajarê Ezazê, roja Duşemê, 7'ê Nîsanê, hemû wesayîtên giştî yên ku rêwiyên ji bajarê Helebê têne Efrînê hatin rawestandin. Hemû welatî veguheztin qereqola polîsan "Daîreya Îstîxbarata Giştî" ya ku ji hêla kesê bi navê "Medhat Mustafa Harmûş" bi nasnav "Ebû Mahir" ve tê rêvebirin ew jî yek ji hemwelatiyên Humsê ye, Kirin.

Komên çeteyan wan her kesê ku nasnameyên ji hêla meclîsên herêmî yên herêma Efrîn ve hatine dayîn bi wan re tunebûn, rawestandin. Her wiha ew gel dabeşî du beşan kirin.

Beşa yekem: Bi tewana xizmetkirina di dezgehên sivîl ên "Rêveberiya Xweser a berê" de hatin girtin û li hember serbestberdana her yek ji wan 700 dolarên Amerîkî cezayên pereyan lê hat birîn.

Beşa duyem: Bi tewana xizmetkirina di refên Hêzên Parastina Gel de hatine girtin, li hember berdana her yek ji wan 2,000 dolar cezayê pereyan li wan hatiye birîn.

**Beriya derketinê dizî û talankirin**

Li gorî tiştên ku di Efrînê de têne teysandin û qewmandin her wiha yên ku ji aliyê Rêxistina Mafê Mirovan ve hatine belgekirin. Ku komên çeteyan hê jî kiryarên dijmirovî li ser gelê kurd didin domandin. Di demên dawiyê de qismek mezin ji malbat û komên çeteyan ji Efrînê derdikevin, lê di berdewamkirina dizîkariya xwe de hê jî bi îsrarin ku dema malbatên çeteyan derdikevin, hemû alavên xaniyê weke derî, pençereyan jê dikin û bi xwe re dibin, herwiha darên zeviyên gel hildikin, qutdikin û bi xwe re dibin. Gelo ev pêkanînên exlaqê mirova ye?

**Qirkirina daristanên Efrînê**

Piştî heft salan ji dagirkirina herêma Efrîn û hewildanên lihevkirinên vegera bi ewle a gelê ku 7 salin di nava pencên koçberiyê de jiyan dikin. komên çeteyan her cûre binpêkirin û hovîtî li dijî mirovan, daran û keviran, li ber çavên rayedarên dagirker ên Tirkiyê û civaka navneteweyî, bêyî tu hesabpirsîn an çavdêriyê pêk anîne. Di çarçoveya qirkirina daristanên gundewarê Efrîn de, di demên dawî de birîna neqanûnî ya daristanên gundên navçeya Cindirêsê yên wekî daristanên (Çiyayê Qezqalî - Çiyayê Hec Hesenlî) ji aliyê çeteyên Emaşat û malbatên niştecihên ku ji aliyê van hêzan ve têne piştgirîkirin ve, zêde bûye. Li navçeya Şêrawa, li gundê Sixunekê, daristanên gund jî ji aliyê endamên Hêza Hevbeş ve, bi taybetî Hemze, têne wêrankirin da ku pê bazirganî bikin û li bazarên herêmî bifroşin.

**Talankirin û hilweşandina xaniyên gelê Îzîdî**

Wêrankirin û talankirina mala yek ji birayên Êzîdî li gundê Êzîdiyan Pafilyon - navçeya Şaran a Efrîn. Piştî ku xwediyê xanî red kir ku bacê bide ku ji hêla niştecîhekî ku xanî desteser dikir ve li ser wî hatiye ferzkirin. Ku tê zanîn li ser hemû gelê gund bac ji laiyê Eniya El Şamiyê ve hatinne ferzkirin. Baca ji bo erdên çandiniyê û xanîyên niştecîbûnê di navbera (200-2000) dolarên Amerîkî de ye, û ji bo her dara zeytûnê ji bo welatiyên gund jî mîqdarek (1-2) dolarên Amerîkî ye.

Ev yek jî di heyva heyî de bi dîmen û wêne hate belgekirin û li ser media civakî belav bû.

Yek ji bûyerên kiryarên li ser jin

Li gorî îdiaya hin medyayê, welatiya "Xeyriya" ji ber nakokiyeke malbatî di navbera wê û hevjîn û zarokên wê de, ji bo wergirtina pasaportekê da ku here gel zarokêm xwe li Tirkiyeyê çûye bajarê Şamê. Lê belê, piştî nîvê şevê roja Çarşemê 19'ê Sibatê, welatiya "Xeyriya" dema ku li qereqola polîsan a Sarmada li gundewarê Îdlibê dihat ragirtin, gazî zarokên xwe kir û got: "Wan ez revandim û hemû pere û zêrên min birin û ez avêtim rêyekê". Ji ber vê yekê, zarokên wê çûn bajarê Sarmada da ku alîkariya wê bikin û vegerînin malê. Her wiha biştî hatina Hikumeta nû bi dehan bûyerên revandin û kuştinê ji aliyê komên çeteyan ve di Efrînê de hatin kirin.

Hêjayî bîrxistinê ye ku bûyerên niha hatine nivîsîn ji aliyê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye ve hatine belgekirin. Ji bilî tiştên ku hatine xuyakirn, rojane bûyerên diziya berhemên gel, talankirina malan, kuştin, desteserkirin, binçavkirin û hwd tên bêk anîn.



# 'Divê mafê hêviyê ji bo Rêber Apo demildest bê dayîn'

Parêzer Basil Ebdê diyar kir ku divê dewleta Tirk Rêber Apo weke avakarê aştiyê ji bo pêvajoya heyî pênase bike û got, "Derengkirina dayîna mafê hêviyê ji bo Rêber Apo rengê dadmendiyê destnîşan nake, pêwîst e Tirkiyê bi awayekî demildest mafê hêviyê bide."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî yek ji mercên herî sereke yên pêkanîna pêvajoya aştî û demokrasiyê bû, lê hîna sîstema tecrîd û îşkenceyê ji destpêka Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Apo ve tê domandin. Tevî ku mafê hêviyê ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocelan li ser maseya nîqaşê ye, lê dîsa dewleta Tirk û hêzên hegemon bêdeng in. Derbarê heman mijarê de parêzer û endamê Yekîtiya Parêzerên Qamişlo, Basil Ebdê ji rojnameya me re axivî.



**'Divê Tirkiyê Rêber Apo weke avakerê aştiyê pênase bike'**

Basil Ebdê diyar kir ku divê dewleta Tirk Rêber Apo weke avakarê aştiyê ji bo pêvajoya heyî pênase bike û wiha got: "Tecrîda li ser Rêber Apo tenê di çarçoveya hişmendiya dewleta nijadperest de tê têgihiştin, hişmendiya ku qet danpêdanê bi hebûna gelê kurd nake. Çendîn caran Rêber Apo daxwazên xwe ji bo aşitî kiribe, hem jî ji banga bidawîkirina şerê çekdarî kiribe, lê hîna jî dewleta Tirkiyê vê yekê wekî têhdîdê dibîne, ne weke derfetke dîrokî ya ji bo çareseriyê. Bêguman, berdewamîya tecrîd û îşkenceyê nîşanê tirsa dewleta Tirk ya zêde ye ber bi demokrasiya rastîn ve û qebûlkirina banga Rêbertî weke mîmarê aşitiyê. Gava yekem ku were avêtin, divê tecrîda li ser Rêber Apo bi dawî bibe û rê were dayîn ku Rêber Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi parêzerên xwe re hem jî bi malbata xwe re bi şêwazekî rêxistinkirî û domdar têkiliyan bike. Ji ber ku ew aliyekî sereke ye di pêvajoyê de gava duyem jî ew e ku divê Rêber Apo ji zindanê derkeve û bikeve zindana malê de be. Di heman demê de wekî divê dewleta Tirk mafê Rêber Apo weke kesekî siyasetmedar ê xwedî bandor qebûl bike, ev yek jî li gorî zagonên navnetewî yên ku dikevin xizmeta mafê hemû girtiyên siyasî."

**'Rêber Apo mifteya çareserkirina doza kurdî ye'**

Ebdê tekez kir ku Rêber Abdullah Ocalan ji bo doza kurdî mifteya çareseriyê ye û wiha domand: "Berfirehkirina Pêngava Azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo dozeke bingehîn e, divê ev doz bi dozên cîhanî ve were rojevkirin, weke dadmendiya guhêrbar, nerînên azad û mafê gelan. Lewma divê yekîtî, zanîngeh tevgerên li dijî nijadperestiyê, çalakvanên jin, çalakvanên jîngehparêz û hwd… tevlî pêngavê bibin. Ji ber ku her aliyek ji wan dikarin bi nerînên xwe vedengekê di projeya Rêber Apo de biafirînin. Herwiha divê rola ragihandinê yê bi gelek zimanan were zêdekirin, hem jî konferans û mîtîngên navneteweyî were lidarxistin. Azadiya fizîkî ya Rêber Apo mijareke kesane nîne, lê mifteya çareseriya bingehîn ya pirsgirêka kurdî ye. Divê yekrêziya kurdî pêk were û kurd axaftina xwe ji çarçoveya pirsgirêkan ber bi çareseriyê ve biguherînin. Divê dostên gelê kurd zexta siyasî û diplomasî li ser dewleta Tirk bikin, ji ber ku çareserkirina pirsgirêka kurdî ne tenê dikeve xizmeta gelê kurd, lê belê dikeve xizmeta hemû gelên herêmê."




**'Divê mafê hêviyê ji bo Rêber Apo zû bê dayîn'**

Parêzer Basil Ebdê da zanîn ku divê mafê hêviyê ji bo Rêber Apo zû were pêkanîn û wiha bi lêv kir: "Mafê hêviyê mafekî qanûnî û mirovayî ye, di pergala işkence û cezayên herî dijwar de ku li ser Rêbertî tê kirin divê hurmeta mafê hêviyê were girtin. 26 sal li ser tecrîda girankirî ya li dijî Rêber Apo derbas dibin bê ku sedema rastîn were naskirin û bêyî lêvegereke dadmendwerî çêbibe. Ev yek binpêkirineke ji zagonên Tirkiyê re ye (Zagon tekez dike ku divê desthilata Tirkiyê kesê girtî piştî 25 salan ji girtinê bi sedema dispilîna baş azad bike), ne ku dewleta Tirk peymana Ewropî ya Mafên Mirovan bin pê bike. Derengkirina dayina mafê hêviyê ji bo Rêber Apo rengê dadmendiyê destnîşan nake, lê belê awayê desteserkirina siyasî ya taybet ji siyaseta xwe nîşan dide. Ji rêxistinên Tirkiyê û navneteweyî tê xwestin ku bêdeng nemînin li hemberî tecrîdê, dosiya Rêber Apo bikin weke dosiya siyasî û hiqûqî ya sereke. Divê ew daxwazê bikin ku hevdîtineke lezgîn li girtîgeha Îmralî çêbibe. Piştre jî komîteyeke navnetewî ya serbixwe ji bo rewşa wî ya di bin tecrîdê de bê avakirin û ev komîte daxwaz bike ku mafê hêviyê di zûtirîn dem de were bicihkirin."

# Çi li hişê stratejîk ê Tirkan hat?



**Volqan Elî**

Tê zanîn Tirk wekî qewm, ev zêdetirî hezar sal bûye ji welatê Asyaya Navîn derketine. Hatine li ser erdên Kurd, Fars, Ereb û gelên din ên herêmê, dema dîtine ku gelên van deran Misilman in ti kes, dest berde ji welat û erd rê jî nade wan ku derbasî welatê Bîzans bin, çînên wan ên ser dest hema ji nişkê ve serê xwe danîne li ser secadeyê û bûne Misilman. Em qebûl bikin yan jî nekin, ev hişekî statejîk dide hewce kirin. Hûn ê bêjin çima? Çê yan jî xirab, eger yek çînê serdest ê qewmekî be, dema ku welatê te ji bê avî û bê xwarinê qir dibe, tu rabî ji bende û çînê xwe yê serdest re welatekî peyda bikî, ev hişekî stratejîk dibe. Ne ku em vî hişî pir diecibînin... Na! ev hebe-nebe hişê bazirganî ye. "Ez ê bibim Misilman, hûn jî welatekî bidin min".

Dema ku qewmên Turanî (Tirk) hatine van deran (welatên Aryenan, Samiyan, Anatolya û hwd.) gelê Kurd, Fars, Ereb û hwd. hebûne. Dîsa wekî dewlet jî Sasanî, Ebasî ( wekî Misilman) dibe ku çînên hakim ên Tirkan bi van gel û dewletan re bi dengê bilind gotina li jor negotibe, lê ji nişka ve bûne wan Misilman tê wê maneyê. Evana mijarên dîrokî yên lêkolînê ne. Ji vê zêdetir, em dixwazin balê bikişînin li ser stratejiyên serkeftî yên serdestên qewmê Tirk. Dema em vê dikin yan tînin ziman ne ji ber ecibandina me yan jî nirxêk jê re diyarkirina me ye. Dîsa jî ev helwesteke 'stratekîk' e. Ji ber ku berhemên encama vê planê bi sedan sal çê û xirab didome. Bi sedan sal e ku Tirk bûne Misilman û erdên li vê herêmê ji xwe re kirine welat. Mînaka din jî, ne tenê ji xwe re Anatolî kirine welat; bûne şûrê Ebasiyan (yanî şûrê Îslamê!?) û jixwe piştî pênc sed sal jî Xalîfetiya Îslamê ji Memlûkiyên Misrî girtine ta 1924'an.

Piştî vê pêvajoyê (bûne Misilma ya serdestên Tirk-1043) rê li pêşiya hişê stratejîk ê Tirkên serdest vebûye. Alparslan Beg di 1071'ê de bi eşîrên Kurd re hevkarî kiriye û karîbûye di encama vê de Bîzansiyan têkbibe, ji xwe re Anatoliyê bikin welat. Bûne Misilman eger em zemîna esasî ya hişê stratejîk ê destpêkê yê Tirkan bihesibînin, hevkariya Alparsalan bi eşîrên Kurd re hişê statejîk ê herî mezin ê qewmê Tirk e.

Yavuz Sultan Selimê Osmanî jî daye li ser şopa Alparslan. Bi eşîrên Kurd re li dijî Safewiyan hevkarî kiriye. Bi vî şiklî kariye dijminê xwe yê herî mezin ê li rojhilat têkbibe. Her wiha xwe berde aliyê başûr, biçe rojhilat. Bi saya vê hevkariyê Osmaniyan ji mîrektiyeke ji rêzê, bûne împaratoriyeke mezin ku di wan serdeman de Behra Spî hema bêje wekî goleke Osmaniyan hatiye. Vaye ev hişekî mezin ê stratejîk e. Ya herî dawî jî tevgera M. Kemal e. Dewletên emperyalîst dema bi şerê emperyalîst ê cîhanê yê yekemîn encam girtin, wekî gornabaş û çeqelan ketibûn li ser laşê împaratoriya Osmanî. M. Kemêl jî (Seyîd Riza û Şêx Seîd pir kêfa wan dihat ku jê re bêjin Mistoyê Kor lê em nabêjin. Lewra dewran digere...)

M. Kemal, bi feyza ku ji Alparslan û Yavuz Sultan Selim girtibû çû li ber dawa Pîr û Şêxên Kurdan, îcazeta şerê li dijî emperyalîzmê wergirt. Gelê Kurd li hemû eniyên şer bi lehengî şer kirin û li dijî emperyalîzmê bi ser ket. Lê mixabin ji ber gelek sedeman, encamê vê hevkariya dawî sûd neda gelê Kurd. Hişê stratejîk ê Tirkan tenê kêrî çînên serdest ê Tirk hat.

Çînên hakim ên Tirk destpêkê hişê xwe yê stratejîk wenda kirin; bi tirsa dekûdolabên emperyalîzmê, bi sorkirinên hindur û derve bi qasî bîst salan gelê Kurd di jenosîdan re derbas kir. Paşê nêzîkî çil salî gelê Kurd xiste pencê qirkirina spîbişaftinê. Ewladên herî bijarte yê gelê Kurd bi şiklê nefes çikiyayî, bi alîkarîya cewhera zêrînî ya zarokên Behra Reş, encax karîbûn navê PKK'ê lê bikin; pişta xwe bidin çend çiyayên asê, çend guleyan berdin hişmendiya dagirkeriyê. Ew PKK'ê jî ji aliyê dewleta Tirk ve 'terorîst' hate îlankirin.

Rêber Apo çi fikirî û çi kir? Dibe ku di hejmareke em nikarin texmîna wê bikin de li ser tiştan fikirîbe. Lê dema ku bangawaziya xwe ya dawî kir, me jê hevokeke pir zelal fêm kir: 'Aştî û Civaka Demokratîk'. Ne got "terorîst hûn in, ez jî we nas nakim". Yanî ji wan xwest ku herî kêm li hişê xwe yê dîrokî yê stratejîk vegerin, eger na bila dîroka bav û kalên xwe dubare bixwînin!

# ‘Rêber Apo ji bo pirsgirêka kurd herdem di nava têkoşînê de ye’

Parlementera berê ya HDP’ê Ayşe Acar Başaran diyar kir ku zêdetirî 30 salî ye Rêber Apo ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rê û rêbazên demokratîk ku di qada siyasî de bê çareserkirin lêhûrbûnê dike û xwedî fikir e.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Parlementera berê a HDP’ê Ayşe Acar Başaran di çarçoveya bangawaziya dîrokî a Rêber Apo a di 27’ê Sibatê û hevdîtinên ku hatine kirin de bersiva pirsê Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**Rêber Apo 30 sal in dibêje ku divê pirsgirêka kurd di zemînekê demokratîk de bê çareserkirin, di 27 Sibatê de jî bangekî dîrokî kir. Ji bo pirsgirêka kurd bê çareserkirin erkên ku dikeve ser milê partiyan çi ne?**

Bangawaziya Rêber Apo a di 27’ê Sibatê de ji bo her kesê tiştek nû bû, dema ku em li dîrokê mêyze dikin, Rêber Apo ji sala 1993’an heta niha ev 30 salin ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rê û rêbazên demokratîk ku di qada siyasî de bê çareserkirin lêhûrbûn dike û xwedî fikire. Rêber Apo di paraznameya 5’mîn de bi awayek zelal radixe ber çav, bi rêbaza ku çawa pirsgirêka kurd bi çareserî û aşitiyane çareser bikin. Ne tenê ji bo pirsgirêka kurd, li gelemperiya cîhanê kirîz û qaosekî mezin heye, ji ber ku hêzên desthilatdar û yên kapîtalîst hertim li gor berjewendiyên xwe daxwaz dikin ku civakê ji nûve ava bikin û li ser tunekirina civakê pergala xwe ya desthilatdariyê ji nûve ava bikin. Rêber Apo hem ji bo gelê kurd hem jî ji bo gelên bindest yên li Rojhilata Navîn û cîhanê, bi taybet jinan bi gelemperî rêbazê çareseriyê dide nîşandayîn. Di vir de carek din sekin û rêbaza xwe nîşan da. Rêber Apo di hevdîtina xwe ya bi Omer Ocelan re jî anîbû ziman ku ji bo ew pirsgirêk bê çareserkirin hem ji aliyê fikir de hem jî di aliyê îrade de hêza min heye ez dikarim çareser bikim. Heman deme de gelek caran jî aniye ziman di bangawaziya xwe de jî dibêje ku ew muxatabeke digere ku ew pê re rûnê û pirsgirêka heyî çareser bike. Rêber Apo careke din wî sekna xwe ya dîrokî dubare kir. Rêber Apo di hevdîtina xwe a bi Partiya DEM re çêkiribû, bi 12 xalan fikre xwe parvekiribû, di wan 12 xalan de bingeha bangawaziya dîrokî a demsalê avakiribû, ew bangawazî ne tene ji bo aliyekî bû, heman demê de ji gel û partiyên siyasî jî re bû. Di demên bihûrî de ew pirsgirêk tene di navbera dewletê û Rêber Apo de hatibû nîqaşkirin. Divî pêvajoyê de lazime tene di wir de sînordar nemîne ji bo ku ew pirsgirêk bê çareserkirin di banga dîrokî de wek gotina dawiyê hatibû ziman pêwîste bingeha hiqûqî û siyasî were avêtin, ji bo wî jî vî berpirsiyartî jî dide ser milê partiyên siyasî hem yên parlemantoy hem jî yên dervay parlementoy, ji ber ku guhertinên hiqûqî û siyasî lazime di bin sîwana parlementoyê de bên kirin ev bi zagon û makezagonên ku jin û gelan nasnake ji nûve werin nîqaşkirin û guhertin.

Partiyên siyasî yên kurd pêwîst e peywir bigrin ser milên xwe, ji ber ku ew pirsgirêk ne tene pirsgirêka kurdan e ku bandora xwe tênê li ser gelê kurd bike. Dema ku em li Tirkiyê û çar parçeyê Kurdistanê mêyze dikin pirsgirêkên heyî bi hêzên navxweyî nehatiye çareserkirin, deste hêzên emperyalist jî ketiye nav wan pirsgirêkan mînaka ku herî zêde li ber çave û pirsgirêk zêde kur bûye gaze û sûriyê ye, ew jî bandora xwe li ser civakê bi gelemperî kiriye. Li Tirkiyê demek dirêje ku siyaseta şer tê meşandin aboriya civakê herê zêde di şeran de tê xerckirin îro li Tirkiyê jî di aliyê aborî de kirîzek mezin li ser civakê tê meşandin, heta ku qirîza Tirkiyê neyê çareserkirin demokrasi pêş nakeve. Pêwîst e gelê kurd û zimanê kurdan bê naskirin, bi qeyûmên antî demokratîk nikarin welat pêşbixin, ji aliyê demokrasi û hiqûqê ve Tirkiye her ku diçe paş dikeve. Taybet dema ku em li mafên jinan mêyzedikin her roj jin bi deste dewletê tên qetilkirin em nikarin vî ji siyaseta şer qût bigrin dest. Di civîna 2024 ‘an de MGK ‘ê de biryara hilweşandinê li hemberê tevgera azadiyê û gelê kurd hat dayîn. Îro civaka Tirkiyê bixwe hildiweşe û xirabûneke mezin bi deste çeteyan pêşketiye. Ji bo ku ev hilweşandin bi dawî bibin pêwîste partiyên siyasî yên Tirkiyê gavên cîdî ji bo çareseriyê bavêjin.

**Rêber Apo di banga dîrokî de dibêje: sosyalîstbûyîn civakbûn e, civakbûyîn jî tê wateya meşa bi gel re, hûn vê çawa dinirxînin?**




Rêber Apo di banga dîrokî de dibêje ku sosyalîstbûyîn civakbûyîne ev peyv ji bona me pir girîng û bi wateye. Dema ku em rewşa cîhanê bi giştî mêyzedikin hêzên emperyalist li gor berjewendiyên xwe tevdigerin. li keleka wî jî civak û civakbûyîn heye civak îro bi bawerî, nasname û bi dîroka xwe dikare xwe pêş bixe û li hemberê zîhniyeta kapîtalîst xwe ji nûve avabike ne ku bi berjewendiya hin kesên derva tevbigerin. Dema em li dîrokê mêyzedikin sosyalîstbûyîn û civakbûyîn cewhera xwe hê jî di dîrokê de veşartiye, bi xirabûna civakê û bi avabûna pergala kapitalist û modernîst civak û jin ji xwezaya xwe dûrketine li kêleka wî jî hertim gelan li hemberê hev dane qirkirin û bi vî awayê berjewendiya xwe mezinkirine. dema ku civak bi xwe di nav çareseriyê da be ne ji bo kesan ji bo berjewendiya civake û xwezayê tekoşîn bike wê serkeftinên pir mezin bi dest bixin. Mînakê vî li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de û li Rojavayê Kudistanê de xwe didin nîşandayîn li hemberê pergala modernîteya kapîtalîst a ku digot tu altarnatîf tuneye mecburin dinav vî pergalê de bijîn ew cewher carekdin derket pêş û xwe bi rêxistin kir û altarnetîfekî ji bo gelemperiya civakê pêş xist. Rêber Apo li hemberê wî pergala kapîtalîst fikren xwe bi salane komkiriye û bi lêhûrbûn û lêkolînên xwe fikrekî nû derxist pêş.

**Ji bo ku ev pêvajo encam bigre pêwîst e dewlet gavan bavêje, çi dibe asteng ku dewlet heta niha gav neavêtiye?**

Dewlet ji bo ku gavan bavêje pêwîst e muxatabê yekemîn ku Rêber Apo ye tecrîda giran a 26 salan ku bi dijwarî didomîne were rakirin. Dewlet ji aliyekî de behsa çareseriyê dike ji aliyêdin ve jî tecrîdê didomîne, ya girîng ku tecrîda li ser Rêber Apo bê rakirin û azadiya wî a fîzîkî bê pêkanîn ku bi fikir û hêza xwe di nav vî pêvajoya ku hatiye destpêkirin de bi awayek aktîf cîh bigre şert û merc bên avakirin. Tenê ji bo bangawaziya ku li PKK’ê hatiye kirin girtina dest kêm dimîne ji ber ku PKK’ê di vî pêvajoyê de ne serdeme encame. Gelê kurd bi sedan salin li ser erdnîgariya xwe bi ziman, nasname û bi dîroka xwe nehatiye naskirin hertim bi siyaseta pişaftinê û bi tundî û qirkirinê re, rû bi rû mane, dewleta Tirk li çar parçê kurdistanê bi siyaseta xwe ew nêzikatî didomîne, bi rêbazê siyaseta qeyûm bi binçavkirinê dixwaze siyasetek qirêj bimeşîne li kêleka wî jî êrîşên li ser qadên parastina medya û rojava her ku diçe dijwar dike, li kêleka wî jî bi gotênên aşitiyê kar tîne. Ji bo ku aşitî pêkanbe gava yekem ewe ku pêşiya Rêber Apo bê vekirin ku bikaribe di vî pêvajoyê de bi hemû hêza xwe cîh bigre ku bingeha siyasî û hiqûqî were avakirin. Ji bo ku PKK’e bikaribe kongra xwe li dar bixe lazime bingehekî hiqûqî û siyasî bê avakirin, û pirsgirêka kurd di asta siyasî de bê nîqaşkirin ku hin zagon bên guhertin, bi hezaran siyasetmedarên ku di girtigehan de dîl tên girtin ji bo wan jî gav bên avêtin , li hemberê deh hezaran kurdên ku doz û dosyay girtinê li ser wan hene pêwîste ji aliyê zagonî ve li parlementoya tirkiyê bên nîqaşkirin û gav bên avêtin, ger ji aliyê Dewletê ve gav bên avêtin em bawerin Rêber Apo bi hêz û fikra xwe divî sedsalê de bi aşitiyane û bi awayek demokratîk dikare pirsgirêka rojhilata navîn çareser bike.





# Ber bi Yekîtiya Kurdan ve

**Sînan Cûdî**

Dîrok şahidiya kêm kêliyan dike ku çarenûsa gelan diguherîne. Gelê Kurd bi sedsalan e ji mafê çarenûsî bêpar maye. Ji bo bi dest xistina çarenûsa xwe Kurdan gelek têkoşîyan, serî hildan, li ber xwe dan û ji bo pêşvebirina nasnameya xwe bedel dan. Lêbelê, piraniya van têkoşînan an hatin tepeserkirin an jî ji ber nikarîbûn bibin Kurdistanî, bi sînor man. Ev rewş ne tenê ji ber sînorên fizîkî, lê di heman demê de ji ber perçebûna îdeolojîk û siyasî jî bû.

Ji ber ku parçebûn ne tenê erdnîgarî ye û ev parçebûn, gel, di warê rewşenbîrî, çandî û siyasî de bêparastin hişt. Tevgerên Kurd, ku di bin zexta dewletên cuda yên li her beşê de pêş ketin, xwe ji îhtîmala avakirina pêşerojek hevdem bi gelê xwe re bi tevahî dûr xistine. Lê belê, hişmendiya neteweyî hewce dike ku parçeyan nas bike, ezmûna berxwedanê ya her yekê veguherîne tecrubeyek hevpar û gel bi yek hişek dîrokî bîne cem hev. Îro, eger Kurd amadekariyê dikin ku bi nasnameya xwe, bi zimanê xwe û bi sîstema xwe ji nû ve derkevin ser dika dîrokê, avakirina vê yekîtîyê pir girîng e.

Di nîvê şerê navxweyî yê Sûriyeyê yê sala 2012’an de, gelê Kurd rêya xwe ava kir. Ne teslîmî avahiya zordar a rejîma Esed û ne jî teslîmî avahiyên radîkal ên olî bû. Di dewsa vê dubendiyê de bi stratejiya Rêya Sêyemîn rêya xwe pêş xist. Rêya xwe bi xwe neqişand. Ev arastekirin, ku li



ser paradîgmaya Neteweya Demokratîk a Rêber Apo hatiye avakirin, ne tenê leşkerî ye; şoreşek civakî, siyasî û çandî jî afirand. Ev sîstema ku balê dikişand ser azadiya jinan, bi rêya meclîsên gel demokrasiya rasterast ava dikir û bêyî ku cudahiya etnîsîteyê hebe, ji bo hemû gelan qadên jiyanê vedikir, ne tenê ji bo Kurdan, lê di heman demê de ji bo Ereb, Asûrî, Tirkmen û hemû gelên herêmê jî bû îfadeya modêlek jiyanek nû.

Gelê Kurd, ku bi modêla xwerêveberiyê hem parastina leşkerî û hem jî rêxistina civakî di destê xwe de digirt, ne tenê li ber xwe da; di heman demê de sîstemê xwe ya demokratîk ava kir. Ji ber vê yekê konferansa neteweyî ya ku dê di 18’ê Nîsanê de were lidarxistin, ne civîneke siyasî ya asayî ye; Ew bersiveke kolektîf e ji bo tenêtiya sedsalî ya gelê Kurd. Ev konferans cara yekem Kurdan li ser axa Rojava tîne cem hev û îradeya wan a ji bo afirandina stratejiyeke neteweyî nîşan dide.

Serkeftina konferansê ne tenê dê destkeftiyên li Rojava nîşan bide. Ew xwedî hêz e ku bandorê li ser çarenûsa gelê Kurd li çar parçeyan jî bike. Ji ber ku tenê bi hişek hevpar û stratejiyeke kolektîf dikarin astengîyan derbas bikin. Ji vê wateyê ve, Rojava ne tenê mînakek e, lê di heman demê de navendek e jî. Biryarên ku di konferansê de werin girtin, dikarin tevahiya erdnîgariya Kurdan de bibe mînak. Ji têkiliyên dîplomatîk bigire heta stratejiyên ewlehiyê, ji polîtîkayên perwerdehiyê bigire heta hilberîna çandî, dikare pêşengtîyê bike. Di heman demê de, ew dikare bingehek stratejîk ji bo polîtîkayên hevpeymaniya nû bi gelên Ereb, civakên Xiristiyan-Suryanî yên li herêmê, Tirkmenan û hêzên pêşverû re jî ava bike.

Yekîtîya ku ji vê konferansê derkeve holê ne tenê dikare rêberiya gelê Kurd, lê di heman demê de rêberiya gelên din ên herêmê jî bike. Ji ber ku modêlek xwerêveberiyê ji bo Kurdan li ser bingeha yekîtiya demokratîk, dê cesaretê bide hemû gelên herêmê ku bi nasnameyên xwe bijîn û beşdarî rêveberiyê bibin. Eger pêşeroja Rojhilata Navîn li ser bingeha tifaqa gelan be, bingeha vê tifaqê dê di bin serokatiya Kurdan de lê bi beşdariya gelan were avakirin. Ji ber vê yekê, yekîtiya neteweyî ne tenê ji bo pêşeroja Kurdan, lê di heman demê de ji bo aştî û ji nû ve avakirina Rojhilata Navîn jî diyarker e.

Di vê nuqteyê de, berpirsiyariya ku dikeve ser milê her takekesê Kurd pir girîng e. Yekîtiya neteweyî tenê bi beşdarbûna pêkhateyên siyasî pêk nayê. Divê gel xwe wekî beşek ji vê yekîtîyê bibîne û tevlî pêvajoyê bibe. Tekezîya Rêber Abdullah Ocalan a ku dibêje “Divê her Kurdek kesayetek siyasî be” ne tenê asta hişyariya gel ji bo têkoşîna rêxistinkirî nîşan dide, lê di heman demê de şiyana wan a girtina berpirsiyariyê û pêşxistina înîsiyatîfê di mijarên neteweyî de jî nîşan dide. Îro, ev bangewazî ji her demê bêtir girîng e.

Ew ne girîng e ku kî li ku dijî, lê ew e ku ew çawa di vê pêvajoyê de beşdar dibin. Ciwanekî Kurd ê li Ewropayê dijî dikare bi beşdarbûna nîqaşên li ser medyaya civakî vê pêvajoyê hembêz bike. Perwerdekareke jin li Başur dikare bi belavkirina perwerdehiya bi zimanê dayikê xizmeta yekîtîyê bike. Li Bakur, hunermendek dikare bi berhemên ku bîra gel zindî dihêle, beşdar bibe. Li Rojava, xwendekarek dikare roleke çalak di meclîsên gel de bigire. Yekîtî bi biryarên ku li jor têne girtin nayê avakirin; bi hembêzkirina li bingehê radibe.

Kurd di serdema herî krîtîk a dîrokê de ne. Ev gava ku di 18’ê Nîsanê de were avêtin, ne tenê çarenûsa îro, lê di heman demê de ya dehsalên pêşerojê jî wê diyar bike. Ev kombûn, xwedî wê hêzê ye ku çarenûsa me diyar bike. Kurd cara yekem e di rewşek ewqas bihêz de ne; Sîstema xwe ava kiriye, gel aniye cem hev û bûye aktorek ku bandorê li polîtîkayên hêzên herêmî dike. Rêya mayîndekirina vê helwestê bi yekîtiya neteweyî ye. Ji ber ku tenê dema ku em yek bibin, dikarin ziman, çand û rêveberîyê xwe jî bibin pêşerojê û azadî tenê dema ku em bi hev re ava bikin dibe rastî.

## Divê têkoşîna demokrasiya rast bê meşandin



**Zekî Bedran**

Desthilatiya Sûriyê ya nû HTŞ’ê bawerî nedan raya giştî ya hindir û ji derve. Rabirdû û dîroka wî pir xerab bû. Lê di pratîkê de çi kirin û çi got qet li hev nedihat. Bi zanebûn hêzên li Sûriyê ji hemû pêvajoyan dûr xistin. Di serokkomariya ku bi rayayên zêde hatibû xemilandin xistibûn makezagonên nû yên demkî de. Bi wê şêwazî zelal e ku desthilatiyekî ku ya rejîma Baas’ê xerabtir bidin avakirin. Baas, rejîmekî tûnd avakir û ev tişt bi nîjadperestiya Ereb ve xurt kir. HTŞ’ê bi zêdekirina nijadperestiya olî rejîmek despotîk, yekdest ava dik e. HTŞ’ê di serdemeke ku guncav ji bona xwe rewa kirinê digeriya jî, li dijî Elewiyan komkujiyeke bi xwîndarî pêk anî. Di rewşa xwe ya niha de serweriya xwe gelemperî li ser Sûriyê nekarî bide avakirin. Gelo hişmendiyekî ku bingehên hundirîn qels e û qirkirinê dike, dema xurt bibe wê çi bike? Ew kevneşopiya komên çekdar yên ku hewl didin bi rêbazên kovî, serîyan jêdikin û tirsandina civakê bibin hêzdar û bibandor bibin tên. Piştî tevahî Sûriyê serweriya xwe ava bikin, ew ê mafê jiyanê ji kesekî re nehêlin.

Hişmendî û avahiya HTŞ’ê tê naskirin, ji ber wê sedemê ye, weke ku dixwazin nayên pejirandin. DYA, NY û welatên Ewropayê HTŞ’Ê ji lîsteya rêxistinên terorê dernexistin. Biryar dan ku ambargoya li ser Baasê bidomînin. Wan got ku ew ê şopandin û lêpirsina pêkanînên wan dê bidomînin. Di van demên dijwar de jî ku di bin çavan de bûn û welat di warê aborî de hilweşiyabû jî, xwe ji komkûjiyên li dijî Elewiyan dûr nexistin. Her wiha, kiryarên rêveberiya wan a heta niha teqez ber bi dûrxistina demokrasiyê ve bûye. Sûriye welatekî xwedî baweriyên pirçandî, netewî û olî ye. Rêveberiya Baasê ya gelekî navendîparêz û tûndrew Sûriye aniye vê rewşê. Pêdiviya Sûriyê bi yekdest û hikûmetên nû yên zordar nîne. Berovajiyê wê pergalekî demokratîk a ku hemû pêkhateyan di nav xwe de dihewîne hewce dike. Sûriya demokratîk tenê dikare hemû bawerî, çand û cudahiyan bigire nava xwe. Lê HTŞ’ê heta niha berovajî vê kiriye. HTŞ’ê hikûmeta demkî wek ku dixwest sazûman kir. Destûra bingehîn a demkî wekî ku rayedarên wan dixwest hat nivîsandin. Qala Kongrê hat kirin, lê wan biryar girt û avahîsazî tenê bi serê xwe diyar kir. Dema ku ev yek dikirin, wan bi Rêveberiya Xweser, Durzî, derdorên cudaxwaz û rewşenbîrên ku beşeke girîng a Sûriyê birêve dibin, ne şêwirîn û ne jî agahdar kirin.

Heta navê Sûriyê ku Baas diyar kiriye jî îdia kirin û dîsa ev nav weke berê hiştin. Bi israr li şûna Komara Sûriyeya Demokratîk dibêjin Komara Erebî ya Sûriyê. Weke ku tê dîtin, hem hişmendiya wan û hem jî rêbazên ku dişopînin de tê xuyakirin ne alîgirê demokrasiyê ne. Bi zanebûn dibêjin ku çêkirina makezagonê û hilbijartinan wê 4 û 5 sal bidome. Ji bo çêkirina makezagonê salek bes e. Ji bo hilbijartinan du sal bes e. Lê ji ber ku ne xwedî bingeheke girseyî ne, dixwazin bi hêza dewletê xwe bi rêxistin bikin û serdest bin. Ew difikirin ku piştî ku serweriya xwe bi dest xistin û derdorên cudaxwaz di rewşek lawaz de hiştin biçin hilbijartinan. Di nîqaşên ku li derdorên demokratîk û raya giştî ya derve tên kirin de fêmkirinên şaş yên girîng hene. Pêwîste ev yek were sererastkirin û daxwaza demokrasiyê ji bo tevahiya Sûriyeyê were kirin û ji bo vê têkoşîn were meşandin. Tê gotin ku li Sûriyeyê divê civak û pêkhateyên weke Elewî, Dûrzî, Mesîhî bên parastin û li dijî komkujiyan li berxwe bidin. Ne şaş e ku di van mijaran de ev bên hişyar kirin. Dema ku HTŞ’ê hêz bibe, ew komên ku tên qalkirin wan di qirkirineke mezin re derbas bik e. Hişmendî û ferasetên wan ne dûrî wan kiryaran e. Hişmendiyekî wan ya desthilat bêsînor ya tûnd heye. Lê şaş e ku mirov pirsgirêkê tenê di vê çarçoveyê de binirxîne. Di vê çarçoveyê de nêzîkbûna wê mijarê dê bibe rûnê li zêdekirina nanê HTŞ’ê be.

Pêkhate û kesên xwedî baweriyên cuda tenê yên ku demokrasiyê li Sûriyê dixwazin? Gelo hemû gelê Sûriyê hişmendî û ferasetên desthildariya HTŞ’ê dipejirînin? Na, piraniya gelê Sûriyê, Erebên Sûnî, nikarin bavêjin hembêza HTŞ’ê ya xwediyê hişmendiya tundrew. Li vî welatî beşeke mezin a civakê heye ku bi awayekî jiyanekê hevpar û xweser pejirandî ye. Mînak, çend ji sedî yê Şamê şêwaza jiyan û hişmendiya HTŞ’ê dipejirîn in? Di vî warî de dema ku li Sûriyê mijarên demokrasiyê tên nîqaşkirin an jî muxalefeteke xurt tê kirin, divê hemû beşên welat li ber çavan bên girtin.

Nerast e ku hemû komên Sunnî li ser navê HTŞ’ê bên nivîsandin, di destê wê de bihêlin an jî wan di nav wan de cih digirin bihesibînin. Her wiha di serdema Baasê de Sûriye ne tenê ji aliyê Elewiyan ve dihat birêvebirin. Nêzîkatî û pêşdîtinek wiha ne rast e. Daxwazên demokratîk û têkoşîna di vî warî de divê hemû Sûriyê bigire nava xwe. Divê rêveberiyên xweser, derdorên demokratîk, rewşenbîr xebatên xwe bikin yek û ezmûnên xwe parve bikin. Ger ku Sûriye bibe mala wan a hevpar, ji kesên ku serî jê dikin re qadan nayê hiştin. Divê destûr neyê dayîn ku HTŞ tevlî mezhebperestiyê bibe û olê ji bo hêza xwe bikar bîne. Pêwîstiya Elewî, Kurd, Tirkmen, Durzî û Xiristiyanan bi demokrasiyê heye, yê Suniyan nîne? Ger Sunnî bên paşguh kirin, mîsogerkirina geşepêdana tendurist ya demokrasiyê dê bikeve xeteriyê. Pêwîste em hemû Sûriyê bêyî ku ji mezheb, netew û gel hev bê cuda kirin, têxin bin sîwana demokrasiyê. Dema ku hemû gel, bawerî û raman hevdû bipejirînin û bi hev re di nava aştiyê de bijîn, wê her kes li Sûriyê bi ewle jiyan bik e.



## Têkoşîna ‘Mafê Hêviyê’

Farûk Sakik

Her roj ev pêvajoya nû bi awayekî cûda û bi aliyek xwe tê nîqaşkirin. Vê heftê hevdîtina Heyeta Îmrali û Erdogan di rojevê de bû. Herkesî ji aliyekê ve nirxand.

Ez nabêjim, tu wateyek van nîqaşan tune ye. Lê esas tiştên ku li ser nîqaşên kûr werin kirin, rewşa Rêber Apo ye. Heger ew azad nebe û bi awayek azad dahilî serdema nû nebe, tu wateyek van axaftina namîne. Hemû vala û li hewa dimînin. Statuyên wek; serxwebûn, federesyon, muxtariyet, rêveberiya xweser, mafê kollektîf, mafê nasnameyê, an jî; berdana çekan, hevkarî û bratiya hezar salî, guhertina destûra bingehîn, hilbijartin, rewşa Rojava, siyaseta Îran û Rojhilatê Kurdistan û hwd.

Ev mijar û têgeh divê piştî azadiya Abdullah Ocalan werin nîqaşkirin. Herkes divê behsa mafê heviyê bike. Behsa soz-gotinên Bahçelî yên lu ser mafê hêviyê bike. Bi israr bi bîra wan bixe ku bahçelî di komcivîna partiya xwe de gotibû, heger Abdullah Ocalan bang bike û rêxistin jî bersiv bide mafê hêviyê were nîqaş kirin.  Banga di 27’ê Sibatê de hatî kirin û rêxistinê jî bi biryara agirbestê bersiv dayê. Dor dora dewletê ye û divê di vî warî de gav bavêje. Herger navêje divê Kurd bi israr vê yekê bigirin rojev û têkoşîna xwe.

Çima azadiya Abdullah Ocalan: Di sala 1979’an de dema çembera li dora PKK’ê teng bû, pêdivî bi azadiya Rêber Apo dîtin. Îtirafkarê demê Şahîn Donmez jî ji dijmin re gotibû “Hûn PKK’ê tune bikin jî heger Abdullah Ocalan bijî wê vê tevgerê ji nû de biafirîne” Li ser vê yekê hevalên wî, wî derbasî cîhek bi ewle kirin. Derbasî Lubnanê kirin. Ev devera hatibû wek zeviyên mayîn kirî bûn. Dîsa li Rojhilata Navîn şerê Îsraîl û Filistiniyan hebû. Qada şer Lubnan bû û PKK’ê jî li wêder bû.

Rêxistina wî li vêder jî ev talûke dîtin û berî her tiştî azadiya wî esas girtin. Her tim ew parastin. Rêxistinê ew parast û wî jî rêxistina xwe parast. Roj hat pêdivî dît û şer da destpêkirin. Ev biryara şer jî di kongreya partiyê de hatibû girtin. Îroj ji wê demê zêdetir bi azadî û ewlekariya Rêber Apo îhtiyac heye. Dema ku rêxistin derbasî qada siyasî bibe salên Lubnanê tên bîhra me. Talukeya wê demê heman talukeya îro ye. Dive Rêber Apo midaxle bike.

Ji xwe, di destpêkê de li Îmrali li ser azadiya Rêber Apo lihevkirinek bi dewletê re hebû. Ev 2 mehe lihevkirin tê îhlal kirin. Dijminatiyek veşartî tê kirin. Divê ev yek were zanîn û midaxle bê kirin. Kurd divê têkoşîna xwe li gor vê serdema nû formule bikin. Azadiya Rêber Apo û ‘mafê heviyê’ bigirin rojeva xwe.  Heger bala we kişandibe di herdu hevdîtinên bi Omer Ocalan re, gotinên Rêber Apo yên ‘tecrîd dewam dike’ dertên pêş. Lê vêderê peyamekê dide, ev peyam ne ji bo azadiya xwe, ji bo azadiya vî gelî dide. Dibêje bila tecrîd rabe da ku ez bikaribim midaxleyî astengiyên li pêşiya doza Kurdistan bikim. Ji xwe dema behsa ‘hebsa mal’ jêre hatî gotin, wî bi mayina li Îmrali (lê di şertên azad) de israr kir. Li vêderê du tişt divê werin armanc kirin. Yek; Azadkirina şertên midaxlekirina serdema nû. Ya din jî; bi mafê hêviyê, azadkirina fîzîkî. Riya azadkirina fîzîkî bi merheleya yekem ancax pêk were. Ango, merheleya bi awayek azad birêvebirina pêngavê ye.